

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULİLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT





ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

CÎROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJEN

KULÎLK

Ji redaksiyona Kulîlk ê re!

Ez yek ji zarokê Kurdîstan û endamê kovara
Kulîlk ê me.

Hevalên heja, ev bû demek dirêj go kovara
Kulîlk negîhayê destê min û hemû endamê Kulîlkê,
bawer bike derneketina Kulîlk ê ji bo me
zarokê Kurdîstan ê kîmasiyek pir mezine û we
ji ji bo me endamê Kulîlk ê ne da daxwîyanîki-
rin sedemê ne derketina Kulîlk ê.

Em hîvîdarin go careka din hevalên redaksiyona
Kulîlk kîmasiyek wilo neke.

Em gîstik, zarok û mezin destêن xwe bidin
hev û ji bo Kulîlkek hîn xurt û bastir kar bi-
kin. Dibê em, kulîlk ê wek kûlîlkêñ buharê bi-
din jîyandin.

Bi hatina buharê û bi bîna gulêñ sor û zer
Kulîlka xwe em bidin xemilandin.

Bi silavêñ biratî...

ŞOREŞ

SÊ BIRA Û PEMAHÎ YA BAVÊ WAN

Dibêjin sê birayên hev hebûn. Bavê wan dimire û dixwazin malên ku ji bavê wan maye, li hevdu par bikin. Lê belê dikin û nakin nikarin li hevdu bikin.

Di davîyê de, biryarê didin, ku herin cem şêzekî, da ku şerîeta wan veke.



Hersê bira dikevin rê û berê xwe didin
Şêxekî bi nav û deng. Bi rê de,dinerin ku
ji dûr ve şexsek tê.

Birayêñ mezin dibêje:




-Ew şexsê tê pîrek e.

Birê biçûk dibêje:

-Ew ducanî ye.

Birê navîn dibêje:

-Ew bê sol e (xwas e).



Gava hersê bira wan tiştana dibên, mero-
vek jî li wê derê ye û deng dihere wî. Dema
ew şesa nêzîk dibe, merov dinere bi rastî ew
pirek e, xwas e û ducanî ye.

Ew merova dide dû hersê biran û ji wan
dipirse:

-Geli biran! Ew tiştên bîska din ku we
gotin, giştik rast derketin. Hûn çi kesin û
hûn bi kû de diçin?

-Weleh heyran, em birayêñ hevin. Bavê me
mir û em ji bo pêmahîya ji mere maye li hev-
du nakin. Ji bo we yekê, em deherin cem şêx

ji bo şerîeta me veke.

Merov gelek meraq dike,ku ew ewqa jîrin, lê gelo çilo li hevdû nakin. Bo wê yekê,merov ji wan dipirse:

-Ez jî dixwazim bi were bibim heval.

-Başê,ger tu dixwazi fermo. Ma tu bi lingê me nayê.

Ew bi hev re rê ya xwe berdewam dikan. Qederkî deherin,rastî deveyekî(hêştirekî)tên. Lê belê,mere bi zor zane,ku ew hêştireke.

Birê mezin dibêje:

-Ew hêştira bi çavekî ye.

Birê navîn dibêje:

-Barê hêla rastê hunguv e.

Birê biçûk dibêje:


-Barê hêla çepê rûn e.

Gava hersê biran,wan tiştana dibêن,zilamek jî li wê derê ye û li wan guhdarî dike. Dema deve nezik dibe,zilam dibîne,ku bi rastî ew deve bi çavekî ye,barê hêla rastê hunguv e,û barê hêla çepê jî rûn e.

Zilam meraq dike û dide dû wan. Gava dig-hêje wan ji wan dipirse:

-Geli biran! Ma hûn ci kesin û bi ku de diçin? Ew tiştên bîska din kû we gotin,giştik rast derketin.

-Em hersê birayên hevin û em diherin şerîete cem şêx,ji bo em pêmahîya bavê xwe li



hevdu par bikin.

Zilam jî meraq dike,ku çilo ew wer jîr û bihişin,lê nekarin malê bavê xwe li hevdû par bikin. Ji bo wê,zilam ji wan dipirse:

-Ez jî dixwazim bi were bibim heval.

-Başe,ger tu dixwaze fermo. Ma tu bi lingê me nayê.

Ew bi hev re deherin mala şêx.

Şêx ji wan dipirse:

-Gelî biraz'yan,de ji min re bêjin,bê hûn hatinin çi?

Birê mezin dibêje:

-Heyran,bavê me çû rahmetê û li ser par kirin a pêmayê wî,me li hev nekir. Em hatin cem cenabê te şerietê.

Herdu merovên din jî,tiştên bi rê de ditibûn ji şêx re gotin.

Şêx jî gelek meraq kir û ji wan hersê biran pirsî:

-Başe,we çilo pêderxist,ku ew şexsê dihat pîrek bû,xwas bû û ducanî bû?

Birê mezin:

-Wextê ew şexsê bi rê de dihat,xwe dihejand û dihat. Ji ber wê,mi zanî bû,ku ew ne zilam e, pîrek e.

Birê navîn:

-Pîrek,wextê ducanî bin,serê xwe bilind dîkin û xwe bi paşde ditevînin û dimeşin.ji ber wê,mi zanî bû,ew ducanî ye.

Birê biçûk:

-Ê xwas dimeşin, lingê wan dişewite û bo wê yekê lingên xwe bêtir bilind dikan û di- meşin. Ji ber wê, mi zanî bû, ku ew xwas e.

Şêx mesela devê ji wan pirsî:

Birê mezin:

-Gava deve ji wê de dihat, serê xwe bi a- lîkî dizîvirand û dihat. Ji bo wê, mi zanî bû, ku ew deve bi çavekî ye.

Birê navîn:

-Gava deve nêzîk bû, mi dît ku mozêñ hun- giv bi dora alîyê rastê ketibûn. Ji bo we mi zanî bû, ku barê alîyê rastê hungiv e.

Birê biçûk:

-Min dît, ku gêrîk bi têra alîyê çepê hil- digşîya. Ji ber wê, min zanî bû, ku barê alî- yê çepê rûn e.

Di wê navênen de, xwarin hat ber wan.

Birê mezin got:

-Ev goşa, goştê berxa ye.

Birê navîn got:

-Va berxa ji kûçikê ye.

Birê biçûk got:

-Şêx pîç e, ne ji bavê xwe ye.

Şêx, bi gotinêñ wan gelek aciz bû. Ew li şêx vedigerînin:

-Heyran, çi ma tu xwe diqeherîne. Tiştêñ em dibêñ rastin. Tu bawer nake, ji xwe re bipirse.

Şêx banî şivanê xwe dike û mesela berxê jê dipirs e.

Şivan dibêje:

-Heyran, weleh ji we tê veşartin, lê ji xwedê nayê veşartin. Ew goştê berx bû û ew berx gava ji dîya xwe çê bû dîya wî mir. Kûçikê me jî nû teliqî bû û wî berxî şîrê kûçikê dimêt. heta mezin bû.

Şêx dihere cem dîya xwe û jê re dibêje:

-Yadê! Ez bext didim tê, ku ez tişkî bi te nakim. Lê tê ji min re rast bibe, ku bavê min kî ye.

Dîya şêx got:

-Lawo, weleh tu ji şivanê me ye.

Şex polî-poşman vedigere civatê û ji wan re dibêje:

-Heyran, ji evda tê veşartin, lê ji xwedê nayê veşartin. Ew tiştên ku we gotin giştik rast derketin. Lê ez dixwazim bizanibim, ku we çilo tê derxist?

Birê mezin got:

-Goştê berxa xuya ye. Wek hûn jî zanin, ne zor e, ku mere zanibe, ew goştê berxa ye.

Birê navîn got:

-Bezê wî goştî li ser hestîya bû. Ji ber wê, min zanî bû goştê kûçika ye.

Birê biçük got:

-Te bi me re xwarin nexwar. Ji ber wê, min tê derxist, ku tu ne ji bavê xwe ye.

Şêx gelekî qeherî û bi hêrs rabû ji wan
re got:

-De zû rabin û herin ji vê de re! Tu şe-
rieta ku ez ji we re vekim tune ye.

Berevkar: Bavê Hêvi

QUNCİKA MUZİK Ė

Notenivisi: Cemîla Celîl

GULÊ GUL BEYAZÊ 17.

Andante

Jor . da. jor . da. jor . da. lo, Ma - la gul Be - ya - zê.

Jorda, jorda, jorda, lo,
Mala gul Beyazê.

Navâ gulê sorda, lo,
Mala gul Beyazê.

Ñadimûsim hingorda, lo.
Mala gul Beyazê.

P'ida, p'ida, p'ida, lo.
Mala gul Beyazê.

Navâ gulê spîda, lo.
Mala gul Beyazê.

Ñadimûsim hîvida, lo.
Mala gul Beyazê.

QUNCIKA DURIKEN ZAROKAN

-1-

Sekê sekê
Sala ne kê
Ilçi zanê
Dabistanê
Gul a çepo
Ala mi jo
Mîr qulingê
Şanî şê
Kur ilê
Bîst li vê
Mi' ev divê.

-2-

Baranê bibar bibar
Çivîka genmê te xwar
Sewîya serê hev xwar

-3-


Çi dara devê êşo
Pel weşandî bi ser qerêşo
Van pismama xwe da pêşo.

Çeçanê çeçanê
Avêt gola hanê
Gola han qamîş e
Mara fîşe, fîş e
Kekê min çavîş e
Çavîşê bi çûk e
Jê re anî bûk e

Bûka qelen dara
Xwed'yê şara zer e
Şara zer li ba kir
Kekê min pê şa kir
Keko tu bi xwedê kî
Tirba mi' ser rê kî
Mistek zirav lêk e

Ziravo genîyo
Avêt paş xêni yo
Diza ji xwer birîyo
Dizo tu du ku de
Ser rêka deştê de
Xencer di hêtê de
Bilûr di piştê de.

Berevkar : Bavê Hêvi



WAN HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHİNİN HEV

MİN DİYE

Gava min zêriy ê
bi awira mîze kirî ye,
bi wan çavêr reş û belek,
hişê serê min birî ye.

Ez gorî min iro diye,
Tu gorî min iro diye.

Ew keçika Kurdistan e,
jêra dibêr gulîstan e,
bi wan çavêr reş û belek,
cî li min kir zîndan e.

Ez gorî min iro diye,
Tu gorî min iro diye.


Wexta min delal diye,
Şerm ji rûya avêti ye,
bi wan çavêr res û belek,
wê sed carî min kuştî ye.

Ez gorî min iro diye,
Tu gorî min iro diye.

ŞAXÊ CIWAN



KURDÎSTAN-1986

NAVÊ VAN HEYWANAN LÌ BİNÊ WAN BİNİVİSİN




.....

.....



.....

.....



.....

.....

MARŞA XORTÊ KURDA

Xortê kurda tevde rabin dil şad û xweşî
Em kurên Kurdistanin her bêjin bijî
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî

Ev welatek pir şêrîne her bêjin welat
Rêberê xwîn firoşin bo jîna welat
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî

Serbilindî kes nabîne be rojêñ dijwar
Wek şêrîn birîndarin bo tene xwîn xwar
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî

Roja cengê em tev mîrin şagirtê Restem
Serbestî doza me ye her roj û her dem
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî

Welatê me pir hêjaye terka wî nakin
Ger divê rêde îro em can fidakin
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî

NAMÎ

KERÊ XEYIDI

Zilamek hebû, êm nedida kerê xwe.ji bir-çîbûna ker ji malê xeyidi û berê xwe da çole.

Xwedîyê kerê bi dû kerê dikeve, da ku kerê xwe bibîne û vegeŕine malê.



Zilam kerê xwe dibîne. Lî dike û nake kerê razî nake, ku ker vegeŕine malê.

Ker dibêje:

-Ez nayêm malê. ji ber ku,ez her tum bir-
çî dimînim.

Xwedîyê kerê,ji wê gotina kerê diqehere
û ji kerê re dibêje:

-Hey felekê

wexta mala me li Qendîlekê

Hebek ceh neket ser tebekê

Ma te nexist nava lefekê.

Ker berê xwe diguhere û dihere.Gur li
kerê rast têن,kerê ji hev de dixînin û di-
xwin.

Xwedîyê kerê dibîhîze.Radihêle şûrê xwe
û dihere şerê guran.

Mêrik ji guran re dibêje:

-We kerê min kuştî ye û xwarîye.Ezê îro
çermê serê we hata bi qaçikê bi saxî bigu-
rînim.

Gur jî banî xwedîyê kerê dikin û jê re
dibêje:

-Tê hirista mirista,

Çar ço li jina xwe xista,

Bila werîsek birista,

û li lingê kerê xwe xista,

çima,me yê kerê te ji hev bixista.

Berevkar: PİRO

DİLÊ TENİK

Di despêka buhare
Bîst û şeşê adare
Em derketin seyranê
Evîn bûme we carê

Mi gelkî jê hezdikir
Mi dil jê re vedikir
Wê dew ji mire çêdikir
Gazinê xwe bi mi dikir

Derdê dil mi ne dî bû
Li ser xêni sekini bûm
Têde pir fikiri bûm
Hedî li mi zîvirî bû
Bi awirê reş nerî
Ez rabûm pêre kenîm
Mi dilê we xweş dikir
Wê ra bû fen li mi kir.
(Yanî zewicî)

ŞOREŞ
BAVÊ AHMED

NAVÊ VAN FEKİ Ü ŞİNKAYAN LI BINÊ WAN BINIVİSİN




.....



.....



.....



.....

.....

.....

QUNCIKA PÊZANÎN Â.

Pirs : 1

Bi şev bûk e,bi roj pepûk e,ew çî ye?

Bersîv :.....

Pirs : 2

Dilîz e,dilîz e,na mîz e,ew çî ye?

Bersîv :.....

Pirs : 3

Kumê delalê,gundırî neval ê,Ew çî ye?

Bersîv :.....

Pirs : 4

Teştek mast,guherek rast, ew çî ye?

Bersîv :.....

Pirs : 5

Tuşo kero,hevsar zero,li pê mi' wero,çî ye?


Bersîv :.....

Pirs : 6

Ker ziriya,buškul firîya, çî ye?

Bersîv :.....

DAN Ü STENDINA DI NAV FILAN DE




Wek tê zanîn, her heywanek dengên cûre-cûre derdixînin.Bi wan denganan dide xuya-kirin,ku xwarinê dixwazin,diqeherin,naxwa-zin mere nêzîkî wan bibe û ya jî ji xwere li hevalekê digerin...

Fîl,li hemberî heywanêن biyanî diqîrin û li himberî heywanêن ji malê an ê nêzîkî wan, enî ya xwe diricifînin.


Eger,fîlêن zarok bigrîn,ji nav fîlên mî yek dihere wan aş dike.

Eger fîlên zarok,ji qeflê xwe veqeti û wenda bibe,fîlên nêr wan dighînin cem diyê wan. ji bo wê jî,dîsa dengekî derdixînin.

Fîl,ji hevdû dûr digerin û diçêrin.gava qeflek fîlan herin derekê û filek bibîne,ku filek zarok xewa wê (an jî wî) tê,xebaerê dide fîlên din. Fîlên di wê qeflê de,giştik li benda wê (wî) fîlê zarok dimîne,heta ew radizê. Dûre giştik bi hevdû re rîya xwe berdewam dikan...





M I J Ü L İ



Ji D ye destpê bike û bi dirênceka
rapelike, bê tu dikane bigêje X ye ?

M I J Ü L İ



Di nav wan her şeş zilaman, zilamek ü di
nav wan şeş mirışkan de, mirışkek ne wek
ê dinin. Ma hûn dikanin bibînin ?

M I J Û L Î



Di nav wan herdu resiman de 5 tişt ne wekhevin, ma hûn dikanin wan bibînin ?


XAÇEPIRS




1




2



•



?



3



5



4






2


BERSİVÊN QUNCIKA PÊZANÎN Ê.

- 1- Tiştekî min heye;ser minare ye,orte ceh-nime ye,binî bahre,ew çî ye?
• (Lampa)
- 2- Tiştekî min heye;ser du beşta ye,orte aşxane ye,ser jî gîha ye,ew çî ye?
• (İnsan)
- 3- Tiştekî min heye;di ku werbi namre,di avê werdibi dimre,ew çî ye?
• (Kaxet)
- 4- Tiştekî min heye;sipî ye,bê dest û bê derî ye,ew çî ye?
• (Hêk)
- 5-Tiştekî min heye;ne li erde ne li ezmane,hêlinâ beg rewan e,kilit li cem sultan e,ew çî ye?
• (Pîreka ducanî)
- 6- Tiştekî min heye;bi çav û bi nige,lê ne dibîni û ne dimeşi,ew çî ye?
• (Meqes)

BERSİVA XAÇEPIRSA HEJMARA BİST Ü ŞESA



	D	Ü	R	B	İ	N
1 ↕	I		M	A	S	İ
4 ↗	B	I	L	Ü	R	
5 ↗	İ			C	E	M
7 ↗	S					
5 ↗	T	E	N	Ü	R	
9 ↗	A	L	I	F		
7 ↗	N	A	N			



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA